

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (142) Sal 24 24 Tîrmeh 2019 z - 2631 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Bi Agirê Kîna Reş Dar, Ber Û Zeviyên Me Têne Şewitandin!

**Na, na…Ev ne ew dojeh a ku navê wê di ola misilmantiyê de hatiye. Ev bihuşta me ya ku îro bi agirê kîn û zikreşiya hovan tê şewitandine!**



**Desteya sernivîser**

Piştî ku, li ser destê hêzên Kurdî, bi alîkariya Hevbendiya Navdewletî, rêxistina terorist a cîhanî hate bezandin û şikandin, dewleta wê hate rûxandin, pilan, derew û xapînokên hin dewletên herêmê bi zelalî ji raya giştî re hatin xuyakirin. Ew dewlet û hêzên ku rêxistina Daişê û xwişkên wê ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe mîna alavekê bikar tannîn, dîn û har bûn, pêla şerê xwe yê gemar li dij gelê Kurd bilindtir kirin, ta asta ku abor û xwerista welatê wî ji xwe re kirine armanc, daristan û zeviyên wî bi hovîtîke kesnedî şewitandin!.

Li Efrîna dagirkirî, hêzên tariyê bi têvedan û rêberiya dewleta Turkiyê, dest bi şewitandina dar û zeviyên zeytûnan kirin, saman û şûnemayên dîrokî dizîn, birin, û ji bo birçîkirin û xizankirina şêniyê wê, nirxê zeyt û zeytûnê erzan kirin. Li vê havînê jî, bi heman armancê, û ji bo têkbirina abora deverê, dest bi şewitandina dexil û danên xelkên Cizîr û Kobaniyê kirin, bi dehê hizaran hiktarên xaka ku bi ceh û genim hatibûn çandin, şewitandin, dû û dûmana agirê kîna wan blind bû, giha…… 2

# Şêx Allî serok Nêçîrvan Barzanî pîroz kir

**Pîrozname**

***Berêz Nêçîrvan Barzanî…***

Serkeftina we di helbijartina serokatiya herêma Kurdistana Îraqê de, ciyê pîrozbahiya partiya me ye, û di qonaxeke weha de ku, bêtir çav li Kurdan vedibin, hêvî ewe ku, hûn dê karibin bi erk û ustobariyên xwe rabin, bona gelê herêm û tevahiya Îraqê, bona Aştî û dadmendiyê, bona nirxên Azadiyê û pêşerojeke xweştir.

Careke dî em we pîrozdikin, digel ciwantirîn rêz û silavan.

29.05.2019

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Allî**
**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**



# Welat û Ceng

**Nazdar Hesen**

Dema ku şer û ceng li welatekî peyda dibin, hemû pêdiviyên jiyana rojane û pêwîstiyên jiyanê têk diçin, zagona zorê serkêşiya hemû zagonan dike, her yek dibe gunehkar û helwesta xwe rast dibîne, dengê çek, zor û zordaran bilind dibin, diyalog û guftûgo, hiş û hişmendî di pileya herî nizim de bi cih dibin û dengê wan winda dibe û nayê bihîstin û ji berê bêtir xizanî, belengazî û nezanî belav dibin û durûtî, sûdarên cengê, siyasetmedar, şirovekar û yên ku dikin bi xeybê dizanin roj bi roj pir û pirtir dibin û ev hemû dibin jêdera geşbînî an reşbîniya xelkên westiya yî û bendewar . Û her ku destarê cengê digere, hêvî û omîdiyên wan kêm û kêmtir dibin, cihê bav û kalan û rojbûnên wan dibin zîndanek teng û tarî û dibe jêdera tirs û nevehesiyê, her roj hoveneyên cengê bi kiryar û awayekî nû tiştekî ji jiyana wan qir dikin û bi xwe re dilovaniyê ji dilê mirovan dikşînin . Welat wargeha ku herî pîroz hêdî hêdî kavil dibe, bîranîn bi êş û xeman mest dibin û hêviya jiyaneke bi ewle û aram di hembêza welêt de têk diçe, dibe xewn û



leylan, belê ceng dojehek ji agir e her tişt vê re tê wêran kirin û şewtandin , mirov neçar û pereng perengî dike hin koçber dibin xwe li av, derya û çolan dixin û hin di bin top û cebelxaneyan de dimînin, hin sûdê ji cengê dibînin û hin ji cengê re dibin êzing, hin hêviyê ji jiyanê dibirin û xweradestî qederê dikin û dimirin û hin jî her tim bi hêvî ne û naxwezin bawer bikin ev rewşa heyî û ev bobelata mezin ya ku bi serê wan û welêt de hatî rast bin û li benda ku ji vê xewneşeva reş hişyar bibin û her tişt wek berê vegere. Bêguman ev jî bi ya dilê me hemiya ne û wek tê gotin : « li cihê ku hêvî hebe, jiyan heye « helbet jî dawiya her cengekê heye û welatê me yê ku ev bêtirî heşt salan ji cengê westiyayî wê roj lê hile, kul, êş û birînên xwe wê derman bike û ji nû ve jiyanê lê veger e .

**Bi Agirê ... Dûmahîk**

asîman. Li şûna wan, tenê arî, rengê reş, rengê al, hiş û baweriyên rêxistina teror û hevalbendên wê yên şovenist man.!

Bêgomane ku tevî gelek têbîn û rexneyên me li kar û barên Rêveberiya Xweser hene, rû bi rû, di civînên xwe yên hevbeş de, em wan şaşî û zêdegaviyan destnîşan dikin, daxwaza rastkirin û çareserkirina arîşeyan dikin, lê di nerîna me de, yek ji armancên sereke yên van êrîşên hovane, serê vê rêveberiyê bi xwe ye!, ji ber ku, bi saya wê, aramî û jiyana hevbeş a hemû pêkhateyan cih girtiye, pilan, dek û dolabên tixumperest û şovenan naçin serî, xelkên deverê dest bi dst û mil li mil, aştiya navxweyî diparêzin, ew bi ser û guhên hev nakevin, rê û derfetê nadin ku neyarên mirov û ronahiyê cihê piyên xwe di welatê wan de çêkin.

Ev ji hêlekê. Ji hêleke din ve, tiştê balkêş ew e ku, asta doza Kurdî li cîhana siyaseta navnetewî bilind bûye, mîna dozeke dadmend û rewa ku çareseriyeke aştiyane dixwaze cih girtiye, ew a ku hiş û sewdan di serê şovenên deverê û neyarên hebûna Kurdan de, yên mîna berpirsên dewleta Turkiyê nehiştiye. Nemaze ku di vê dema dawî de, destpêka têkiliyên siyasî ji bal dewletên mezin ên cîhanê bi doza Kurdên Sûriyê re têne avakirin, û guftûgoyên beşdarkirina nûnerên Rêveberiya Xweser di civînên çareserkirina qeyrana Sûriyê de.

Tevî ku gelek ziyana aborî, derûnî û civakî li gelê me, nemaze cotkaran bûye jî, lê ji ber em armancên wan aliyên ku ev tewana kirêt kirine nas dikin, pêwiste em şiyar bin û hemû bi hev re pilanên wan pûç derxin, vê ezmûn û destkeftiyê ji gelê xwe re biparêzin, birînên xwe derman bikin, xaka pîroz a bav û kalan bernedin, li ber xwe bidin û xebata xwe ya aştiyane bidomînin, xeleka dost û alîgiran ji vê dozê re berfireh bikin, bi nimûne û belgeyan ku rûyê dagirker û xulamokên wan ên hov li hember raya giştî û rêxistinên navnetewî reş bikin. Di heman demê de, em guh nedin wan kes û aliyên ku di bin perdeya hin diruşmên welatperwerî de, kîn û dubendiyê di nav hêz û aliyên Kurdî de belav dikin, nakokiyan kûr û fireh dikin û rê li pêş diyalog û lihevkirinê dixitimînin. Herweha, divê em bawer bin ku ev ton gotar û siyaset, tu aqilmendî û mêrxasî tê de tune ye, tenê ew dilê şoven û dagirkeran hênik dike!.

Li dawiyê, xwesteka me ji Rêveberiya Xweser ew e ku bi baldarî û berpirsiyarî rewşa cotkarên me di ber çavan re derbas bike, û ji ber ku gelê me di encama şerê dij terorê de ev baca giran daye, pêwiste alîkariya diravî ji Hevbendiya Navdewletî bê xwestin, û eger hevbendiyê xwe neda ber, Rêveberî dest hilîne, bê dudilî cotkarên me yên ziyan dîtine, ji diraviya rêveberiyê qerebû bike.

Digel ku peyva yekrêziya Kurdan pir hatiye cûtin jî, lê, bê derengî tê xwestin ku rewşenbîr û nivîskarên me yên dilsoz, hemû welatparêzên serbixwe û yên di partiyan de, bi hemû hêza xwe, çand û gotara rêzgirtin û ji hevhezkirinê belav bikin, ji bo hemerengiya civakê û piraliya wê têbikoşin, û daxwaz bikin ku partiyên me, di vê qonzxê de, nakokiyên xwe li hêlekê deynin, li hev rûnin, pirs û xalên ku ben li stoyê gelê me teng kirine gengeşe bikin, û ji bo sistkirina wî, bi dil û can, bê derengî xebatê bikin.

# HEVPEYMANA KARÊ HEVPAR

*Di kongirekî rojnamevanî de, Îro roja Çarşemê 15.05.2019 an, li hola Cigerxîn ya gongireyan – bajarê Qamişlo, bi beşdariya hin endam û kadroyên partî, kesayetiyen serbixwe û alavin ragihandinê, herdu partiyan (Partiya Demokart a Pêşverû ya Kurd û Partiya Yekîtî ya Demokrat a kurd Li Sûriyê) hevpeymaneke karê hevpar ragihandin.*

*Despêkê, Mistefa Meşayêx cîgirê sekretêrê Yekîtî, pêşwaziya beşdaran kir, û Ehmed sulêman ji dêvla Ebdil Hemîd Derwîş sekretêrê Pêşverû deqa hevpeymanê ya bi Erebî xwend, û Mihyedîn Şêx Alî sekretêrê Yekîtî deqa bi Kurdî xwend.*

*Piştre, herdu sekretêran bi rengekî fermî Hevpeyman îmzekirin û bersivên ragihandinê dan.* **Eve deqa hevpeymanê bi zimanê Kurdî:**



## HEVPEYMANA KARÊ HEVPAR

*Wergera ji Erebî*

Di encama têkiliyên li pêş, ên di navbera herdu partiyan de, Partiya Demoktar a Pêşverû ya Kurd û Partiya Yekîtî ya Demokrat a kurd Li Sûriyê civatên berpirsiyar di navbera serkirdayetiya herdu partiyan de hatin lidarxistin, û di encam de, rêkeftina karê hevpar li ber ronahiya bingeh û xalên jêrî hate erêkirin:

**Yek:Di warê nîştimanî Sûrî de:**

A: Hemî hewildan bêne bikaranîn, bona cîbecîkirina aştî û aramiyê li welêt, piştî têkçûna şêweya ewlehî û leşkerî. Zarzimanê diyalog û gotûbêjê ligel karbidestiya navendî li Şamê bibe rêbaz û metod, herweha jî ligel hemî hêz û navnîşanên siyasî, civakî û rewşenbîrî, nexasim ên ku bi erênî xwe nêzî pêwistiya lidarxistina kongirekî niştimanî Sûrî gelemper dibînin, da ku giringî û erkên vekirina rûpelekî nû li xwe bigre, û bighêje encamên di xizmeta cîbecîkirina naveroka biryara Encûmena Ewlehî ya navdewletî jimar(2254) a ku tevan li ser erê kirine, bona peydakirina çareseriyê ji kirîza Sûrî re ya ku ji heyva Avdara sala 2011an de hatiye teqandin.

Herweha ji civata navdewletî û bi taybetî ji dewletên kartêker di pirsa Sûriyê de bête daxwazkirin, ku hewildanên xwe, bona peydakirina çareseriyeke siyasî ji kirîza Sûriyê re bikine yek.

B: Belavkirina çanda pejirandina yên dîtir, li ser bingeha bidûrxistina cudakarî û nefretkariya ku jêdera wê nexweşiyên quretiya netewî-olî an mezhebî ye, da ku lihevkirin û berfirehtirîn hêz û rêz bête li sazxistin, ji bo têkbirina pirojeyên islamî siyasî ya ku, baskên wê yên leşkerî û hovane cîbecî dikin, nemaze rêxistinên El-qayide ya terorist a ku gelek navan bikar tîne, û rêxistina «Daiş».

C: Xebat bi hemî şêweyên rewa û di hemî waran de, da ku, Turkiya hêzên xwe yên dagirker ji bakurê welêt vekêşe sînorê xwe yê navdewletî, destpêk ji herêma Efrîn û Idlibê, di Ezaz, Bab û Cerablusê re derbas be, da ku rê li ber çareseriya ku ji kirîza Sûriyê re tête xwestin vebe, û bingeha têkiliyên cîrantiyeke bi rêkûpêk bi Turkiyê re bête avakirin. Herweha Colan a Sûrî ya di bin dagirkeriyê de ye li gor biryarên navdewletî yên rewa û naskirî li xwediyan vegere.

D: Tekezkirina bîrdoza demokratîk di nêzîbûna ji pirsa jinê re, bi armanca bikaranîna mafên wê yên serûber û bê kêmkirin. Herweha, domkirina berzkirina pirsa dadmendiya civakî , bona jinavbirina xizanî û nezaniyê.

E: Daxuyakirin û şirovekirina başiyên têgihaştin û sîstema nenavendiyê di rêvebirina karûbarên welêt de bi gelemperî, di çerçewa parastina yekîtî, aramî û serweriya Sûriyê ya herêmî de, digel destnîşankirina ku+ weke nimûne+ rist û sîstema bergirî, herweha ya siyaseta derve di istoyê navendê de dimînin. Û bêgoman, cîbecîkirina sîstema nenavendî, sivikkirina barê Navendê ye, herweha pêdivî û egerên biserxistina pilan û pirojeyên avakirin û geşepêdanê li seranserî herêm û parêzgehan peyda dike, û siyasetên guhnedan û danaliyekê bi dûr dixe.

**Du: Di warê Kurdî û mafên daqurtandî de:**

A: Tekezkirin li ser rastiya hebûna Kurd ku pêkhateyeke dîrokî, xwezayî, resen û beşek necuda ji gelê Sûrî ye, û bi serjimartinê di welêt de, duyemîn netew e piştî pêkhateya netewî ya Ereb e. Û hêjaye bibe xwedî mafê parastineke destûrî ji zimanê wî yê dê re, û mafên xwe yên netewî yên rewa jiyan bike. ……….

4

# Zevî di navbera hêviyan û şewitandinê de

**Nûşîn Bêcirmanî**



Ne tenê bi tang, top û balefiran, şerê welat û gelan tê kirin, lêbelê, şêweyên şer gelek in, bi wî şerî hêvî û omîdên wa miletan qels û lawaz dikin, hêvî û baweriyên wî qels dikin, ji bo hin bi hin, bi demê ew re têk herê.....

Bê guman, piştî biserketina şervanên kurd YPG, YPJ û bi wan re hêzên (HSD), li hember teror û çeteyên hovane weke DAIŞ û CEBHETELNESRE yên ku beşek mezin ji xaka Sûriyê desteser kiribûn û hemî kiryarên kirêt bi nişteciyan re bikar tanîn......

Helbet ev serkeftinên gewre ne li bayê rijîma Turk û Sûriyê bûn, ew ê hemî hewildanên xwe bikin ku van serkeftinan bê wate bikin, alozî û astengan jê re peyda bikin, herweha Rêxistina DAIŞê jî wilo. Vêce, kiryara herî tund li hember gelê kurd û pêkhateyên ku pêre dijîn birêve birin, ew jî şewtandina zeviyên hemwelatiyên vê deverê bû, bi teybebetî zeviyên cotkarên kurd; da ku ziyanên abûrî ji miletê kurd re di Rojavayê kurdistanê de peyda bikin.....

Li Kobaniyê û gundên wê bi hezarên donoman zeviyên genim û ceh şewitîn bi milyarê lîreyên sûrî ziyana cotkarên kurda bûn li vê deverê.

Li Cezîrê jî, bi sed hezaran donim ji zeviyên hemwelatiyan hatin şewitandin, piraniya wan yên cotkarên kurdan bûn, ew jî bi miyarên lîreyên sûrî ziyan li wan bû.

Weke mînak di kêmî heftiyekê de bi sedhezarên doniman li Sinceq, Aliya, koçera û rojavayî Qamişlo hatin şewitandin bi heman şêweyî, (di nîvro de - roja ku ba xurt be - destpêka şewatê ku li pêş wê gelek rûber ji zeviyan hebe – bihtirê wan yên kurda be), ev têbîn jî şewtandina hin ji zeviyên pêkhateyên din, tune nake, çiko hin ji yên wan jî şewitîn.

Bi şev zeviyên gundê Sûgiya û Sofiya li başûrî bajarokê Tirbesipiyê ne, nêzî 1500 donimî şewitîn.

Demjimêr 11 berî nîvro agirek ji aliyê gundê Nebû›a agir vêket û berê xwe da gundê Byaza mezin, Tilberhem, Riheya, Gundikê seyid, Girê pirê, Girdêmê Helîmê, Maşoq û wilo ta giha bendava Mizgeftê, bi dirjahiya bihtir ji 20 k.M û ferehiya 1015- K.M. gelek gund ji van zeviyên wan bi tevayî şewitîn.

S i l ê m a n.........5

---

**Hevpeyman ... Dûmahîk**

B: Şermezarkirin û gunehbarkirina xwediyên pêdaçûna dijayetiya gelê Kurd, ên ku tovên nijadperestî û zikreşiyê li dijî hebûna wî diçînin û di serî de, xelekên Toranîzma nijadperest a Faşist a ku rêya xwe di herêmê de dibînin û bûne xwedî rol.

C: Zengînkirin û nûjenkirina xalên hevpar, şêweyên têkildarî û hevşêwrê, di çerçewa tevahiya livîna Kurd di welêt de, da ku rê vebe û derfet li pêş lihevkirinê, bidûrxistina xircir û durişmekariyê peyda bibe, bona pêkanîna lidarxistina kongirekî nîştimanî giştî ji Kurdên Sûriyê re.

**Sê: Di warê netewî Kurdistanî, Herêmî û navdewletî de:**

A: Rêzgirtina taybetmendî û rastiyên rojeva xebatê li her meydanekê li tevahiya warên Kurdistanî, da ku biryara siyasî li her beşekî serbixwe be, digel avakirin û geşkirina têkiliyên dostanî û biratiyê di navbera gelên herêmê de bona pirsên aştî û azadiyê.

B: Bibine xwedî rol di belavkirina pirensîp û çanda netundiyê û nefretkirina zimanê şer û pevçûnan di çareserkirina pirs û nakokiyan de, û berê xwe bidine zagona navdewletî û belgeyên Yekîtiya Netewan, nemaze jêderîna navdewletî ya mafên mirovan.

C: Danasîna giringiya cîbecîkirina biryar û dîtinên kongira Parîsê ya serokên dewletên cîhanê ya ku ji bona parastina heyam û jîngehê hatibû lidarxistin.

Soza herdu Partiyan ew e ku li gor bingeh û xalên jorî her dê xebatê bidomînin bona başî û berjewendiya gel û Sûriya me ya birîndar.

**Muhyedîn Şêx Alî**
**Sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat.**

**Ebdilhemîd Derwîş**
**Sekreterê Partiya Demokrat a Pêşverû a Kurd Li Sûriyê ya Kurd li Sûriyê.**

*Çarşem 15ê Gulana 2019an.*

# Em rêya mezin û zanyarên xwe bernadin

**Newafê Bişar**



Piştî bûyerên xembar û dilêş ku bi giranî jiyana gelê me hejandin, çi li başûrê welêt dema dagirkirina Kerkûkê, çi jî tewanên mezin ên ku li Efrînê bûn û hê jî dibin, hovîtiya neyar û durûtiya dostan aşkere û diyar bûye, gelek xwişk û birayên me ji nivîskar û rewşenbîrên Kurdan bê hêvî bûne, gotin, peyv, û hilwestên ku vên û morala gel diçilmisînin ji dev û pênûsên wan diherikin!.

Di vî warî de, pêwiste em di bîra xwe de bînin ku gelê Kurd ê ku bi sedsalan di bin destê neyaran de dîl û jar maye, kerxên hovane, kuştar, û hemû rengên jiyana tal a mîna zilindarê dîtiye, di mercên nezanî û xizaniyeke bê sînor de salên giran û dirêj derbas kirine, ku di siha wê rewşa kambax û wêran de, gelek nexweşiyên civakî û derûnî di hiş û canê wî de cih girtine, ew ên bûne egera perçebûn û kêmbaweriya bi xwe, û bi hev. Lê, digel hemû êş û azaran, wî gelî xwe winda nekiriye, ziman, wêje û folklora xwe ji bîr nekiriye û welatê bav û kalan parastiye, bernedaye, her ew di çavên neyarên hebûna xwe de stirî, kelem û xirar maye… Ne tenê wilo, wî serî neçimandiye, her ku derfet dîtiye, bi mêranî rabûye ser piyan, têkoşîn kiriye, serhildan û şoreşên azadiyê dijî dagirkerên welêt bi rêve birine.

Ew gelê ku ewqas êş û cefa kişandiye. Ew gelê ku xizanî û nezaniyê hiş û çavên wî kor kiribûn, îro bi milyonan keç û lawên wî xwendine, hişyar bûne, xwe nas kirine, dost û neyarên hebûna xwe ji hev cuda kirine, û bi dehê hizaran zana û pisporên welatparêz peyda bûne. Tevî vê rewşa girik a tevlîhev a ku îro em tê de dijîn, lê, çi dûr çi nêzîk, ew jî dê mîna hemû gelên cîhanê azadiya xwe bidest xîne, welatê xwe ava bike, bi aştî û aramî bi hemû pêkhateyên deverê û miletên cîhanê re bijî.



«Kerkuk»



«Efrîn»

Lê, çendî em nakokiyên xwe bidin paş û berjewendiya gel bidin pêş, çand û gotara lihevkirin û hezkirinê di civaka xwe de biweşînin, bi firehî belav bikin, rê li ber gotara hişk û tund bigrin, ewqas zemîna yekîtiyê xurt dibe, û roja azadiya gelê me nêzîk dibe. Ji ber vê rastiyê, em bê hêvî nabin, rêya zaniyar û mezinên xwe bernadin!...

**Zevî ... Dûmahîk**

B. Ciwan Yek ji cotkarên gundê (Tilberhem) e dibêje: (zeviyên cotkaran li gundê me bi tevayî şewitîn, agirkujên ku hatin nikarîbûn van agiran kontrol bikin çiko berê agir gelek fereh bû, û amadebûna agirkujan bi xwe jî ne bi rêkûpêk bû, me dizanîbû nema em karin zeviyên xwe biparêzin, em ji şewata gundê xwe vêce ditirsehan, me gundê xwe bi Çewal û sîtilên avê parast da em agir dûrî gundê xwe bikin.

Ebas B. Eyaz ji gundê (Gundikê seyid) got:

( zeviyên genim û ceh yên gundê me şewitîn, agir xurt bû, şer pêre nedibû tevî hemû hewildanan, di encamê de yek ji gundiyên me bi navê Xelef B. Mehmûn ku hatibû bi terektora xwe li pêş agir xakê cot bike da agir derbas nebe, lê mixabin dest û lingên wî di nav agir de şewitîn û Terektora wî jî bi temamî şewitî).

Eger em bi hûrnêrînî li diyardeya şewtandina va zeviyan mêze bikin, merov rastî çend têbînên balkêş dibe :

1 – raste tu agir û şewat bê sedem nabe, lê gelo, îsal, agir û şewatên zeviyan bê kirde bûn? Na! Li gorî dem û cihên van agiran, merov digihe wê baweriyê ku destin li pey van agiran hebûn.

2 – ji ber ku dest li pey hene, em dê rastî vê pirsê bibin: ev şewat xizmeta berjewendiyên kê dike? Wilo jî em xweş bawerin ku rijîma Turkiyê û ya Sûriyê, di heman demê de çete û terorîstên bi va herdû rejîman ve girêdayî, li pey van agir û şewata ne, çiko bi rengekî pîvayî û li gorî heman sîstemê ev agir dihatin vêxistin.

3 – Zevî li gelek cihan û di hemen demê de bi hevre dihatin şewitandin bo agirkuj nikaribin wan kontrol bikin.

# S.F.P.Z.K.S ( K. NEFEL) roja zimanê kurdî li Qamişlo bi bîr anî

Bi boneya roja zimanê kurdî, S.F.P.Z.K.S ( K.Nefel) di 152019/5/ê de li bajarê Qamişlo, hola Silêman Adê, û bi beşdariya jimarekê ji rewşenbîr û zimanhezan, çalakiyek lidar xist.

Di destpêkê de mamoste Diljar Bêkes bixêr hatina mêvanan kir, ji wan xwest ku demeke bêdeng li ser giyanê gorbihuştên ku xwe di ber zimanê kurdî de westandine, rawestin.

Mamoste Canda Erefat, endama k. Nefel, gotina Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê ( şaxê Cezîrê ) xwend.

Di pey re, Diljar Bêkes, diyar kir ku biryara k. Nefel ( masa Diljar Seyda) bo zimanê kurdî mehane lidar bixe, vê carê mêvanê masê zimanzan Berzo Mehmûd e, pênaseya wî diyar kir.

Mijara ku birêz Berzo li ser axivî ( pirsgirêkên rewşenbîriya kurdî ) bû, û li ser hin pirsgirêkên zimanê kurdî jî rawestiya....

Derfet jî da mêvanan ku pirsên xwe bikin û nerînên xwe jî diyar bikin.

Li dawiyê, birêz Diljar spasiya kek Berzo û beşdariya mêvanan jî kir, û ev roj, roja zimanê Kurdî li wan û tevaya gelê Kurd pîroz kir.



**Qamişlo**
**S.F.P.Z.K.S ( Ş. Cezîrê)**

# Daxuyanî : Saziya Fêrkirin Û Parastina Zimanê Kurdî_Beşê Ewropa

Ji encama şer û cenga Sûriyê ya kampax û wêranker, bi sedhezaran ji gelê me, ji rojavayê kurdistanê, aware û şerpeze bûn, xwe li sînor, derya û metirsiyan xistin û penaberî welatên curbecur bûn, rêjeyeke pir ji wan berên xwe dan welatên Ewropa û nemaze Almaniya.

Bidûrketina gelê me ji xaka xwe, ji cih û warên xwe, ji nav civaka xwe metirsiyek li ser paşeroja gelê me, nemaze jî li ser nifşê nû dighîne ku ew li civakine nû, li nav çandine nû û bi zimanine nû tên fêrkirin û perwerdekirin, ji ber vê yekê, zimanê me yê ku berê jî qedexkirî, û bi her awayî şerê wî ji aliyê dijminên gelê me ve tê kirin, û ew hewl didin ku zimanê me tune bikin û di nav zimanên xwe de bipişivînin û wenda bikin.

Ji ber vê rewşa awerte ya ku li hember çand û zimanê me derketiye, çend mamosteyên xemxwar û hezkiriyên zimanê kurdî yên ku berê jî li welêt bi karê fêrkirin û parastina zimanê kurdî radibûn, van mamosteyan li xwe girtin ku ew li derveyî welêt jî bi stubariya xwe rabin û hewl bidin ku zimanê kurdî jî di dibistanan de bi fermî bê xwendin .

Jibo vê yekê çend mamostan di roja Şemiyê de li dîrok: 06.07.2019an li bajarê “Bochum” ê li Almanya konfiransek bo damezrandina şaxa Saziyê di bin van durişman de :

Ziman hebûna me ye .

Ziman nasnameya mirov e.



Li dar xistin, û li ser rewşa zimên û giringiya wî ji bo hebûna gelê me guftûgu kirin û li ser rawestîn.

Civat bi kêliyek bê deng li ser giyanê pakrewanên kurd û kurdistanê dest pê kir.

Paşê mamosteyên beşdar xwe bi hev dan nasîn û kurtegotinek li ser karên xwe dan xuya kirin.

Gava siyem ji lîsteya kar, mamosteyekî ji komîta birêvebir a konfiransê li ser S.F.P.Z.Ks kurtegotinek got û giringiya vê civînê û pêwîstiya berdewamkirina karê saziyê li derveyî welêt da xuya kirin.

Ji welêt jî van mamosteyan : Merwan Berakat ji Efrînê - Dilovanê Deştî ji Tirbe Sipiyê û paşê jî mamoste Nûşîn Becirmanî endamê têkildariyê..........

7

# Ji Zeviyên Ceh û genim ên me, Tenê ariya reş maye!

**Mesûm Şûkrî Dawûd**



Tevî ku zivistana me ya îsal bi baran, xêr û bêr bû, hêviyên xelkên me yên devera Derbasiyê bi dahat û berhemeke baş hebû, lê sed mixabin ku ew xewn û hêvî bi agirê ku bi dexlên wan ketibû re şewitîn û winda bûn!. Bi sedê hiktarên zeviyan ku gihabûn ber çinînê ji ber gelek sedeman şewitîn.

Heta dawiya meha Hizêranê, li gundewarê Derbasiyê agir kete zeviyên van gundan:

Sinceq, Himêdiyê, Ferhiyê, Şorê, Çolbistan, Xirbet elîd, Şerefiyê, Sefer, Meşqoq, Berkevirê, Bîrkinês, Bişêriyê, Qolan, Selam, Til dîkê, Izamiyê, Başo, Hemdaniyê, Ferhiyê, Sorsorkê, Qeremaniyê, Şê Mensûr, Qetînê, Melek, Girkundê, Birîva û Gundê Jinê yê nûjen.

Ji bilî ku rêxistina teror û hevalbendên wê ji neyarên gelê Kurd ev kar li xwe girtine, berpirsiyariya xwe di ber de nîşan dane jî, lê hin sedemên din hene ku rê li ber şewata dexil û zeviyan dûz kirine, hin ji wan ev in:

1. Avêtina quncikên çixaran ji pencerên aotobas û trumpêlan, yan jî şewitandin geyayê hişk ê derdora zeviyan, yan jî hebûna hin tîtik, cam û şûşe ku bi hebûna tîrêjên rojê di vê germa havînê de, agir bi pûşikê hûr dikeve û ew agir gur û geş dibe.

2. Dema ku li destpêkê, hawar bi agir ve negihe, ew gur dibe, rivînz wî bilind dibe û nema jêrdest dibe, hişk û ter dide ber xwe, dişewitîne.

3. Rêveberiya Xweser, tu amedekarî ji vê bûyerê re nekiribû, ew a bûye egera ku agir bi sedê hiktaran dixwar û tu kesî nikarîbû wî bitemirîne.

4. Agir, zevî û firaze ser û ber dane ber rivîna xwe û ew şewitandine, ev ê bibe ku, ka û êmê pez û dewaran di werza zivistanê de kêm bibe û bandor li jiyana ajalan bibe.

5. Kêmbûna hejmara patozan(derasan) li deverê ku îsal dexil bi piranî hatibû çandin û berê wî qenc bû, ji bilî ku xwediyên patozan pabendî bi nirxê çinînê yê ji bal Rêveberiyê ve hatibû destnîşankirin nekirin.

6. Ji ber nebaşiya sûtemeniyê, pir caran çirûskên êgir ji şekmanê trumpêlan difirîn û agir bi dexilan diket, ji bilî hin şaşiyên çinînê.

7. Hin caran çirûskên êgir ji têlên Elektrîkê yên di nav zeviyan de ne difirin û dibine sedema pêxistian agir.

8. Gazind ji Rêveberiya Xweser têne kirin û ew berpirsiyariyê hildigire ku nikarîbû dexilê welatiyan ji şewatê biparêze.

9. Armanca neyarên gelê me ji vê şewatê ew e ku vê Rêveberiyê di çavên xelkên me de reş, biçûk û sûcdar bike, aramî û jiyana hevbeş a deverên me têk bibe.

10. Piştî şikandina Rêxistina Daiş a terorist û rûxandina dewleta wê li meha Avdara bihurî, îro ew dixwaze tolê ji Kurdan hilîne, abora wan bimrîne û wan toşî qeyranê û birçîbûnê bike.

11. Mixabin ku di vê kirîzê de, Hevbenda Navdewletî bi erkên xwe yên ranebû, û ti alîkariya teknîkî ji bo temirandina êgir pêşkêş nekir.

Di vî warî de, dixwazim bêjim ku pêwiste xwediyên pez û şivan, pez û sewalên xwe di nav ariyê de nedin çêrandin, ji ber ku ew nexweşiyên mîna «INTROTOXIMIA» bi ajalan re peyda dike.

Li dawiyê, ji gundewarê devera Derbêsiyê hin ziyanên şewatê mîna belge gihane destên me, em wan ji xwendevanên Newrozê re diweşînin û bi gelê xwe re parve dikin:

**Gundê Çolbistan:**

Reşîd Bedran: Xertûmên avdana bi şêweya nûjen bi buhayê650 000 Ps şewitîn.

Mihemed Elî Şerîf Ehmo: 30 donim

Silêman Şerîf Ehmo: 10 donim

Mihemed Şêxo Ehmo: 30 donim

Hemîd Remo Remo: 30 donim

Ebduselam Elî Seîd:15 donim

Silêman Mihemed Ehmed: 6 donim

Hac Hemîd:30 donim

Cemîl Elî Ehmed: 20 donim

Reşîd Remo:……… 8

---

**Daxuyanî ... Dûmahîk**

yê SFPZK li Cezîrê bi riya telefûnê şanaziyên xwe xuya kirin û spasiya mamosteyên ku beşdarî vê civînê bûne kirin û serkeftin ji karê mamosteyan re xwastin .

Di vî konfiransî de, mamosteyên zimanê kurdî di riya vê daxuyanê re banga xwe li revenda kurd li Almaniya bi taybetî û li Ewropa bi gelemperî kirin, û ji wan hêvî û tika dikin ku li zimanê xwe xwedî derkevin û wî bi zarokên xwe bidin hezkirin, di malên xwe de, di danûstandinên xwe de bi zimanê xwe bi hev re û bi zarokên xwe re biaxivin.

Li dawiyê mamosteyan ji nav xwe komîteyên ragihandin, têkilî û birêvebir destnîşan kirin û li xwe girtin ku karê saziyê li Ewropa bi rêk û pêk bikn.

Almaniya 07.07.2019Z

**Saziya Fêrkirin û Parasitena Zimanê Kurdî_ Beşê Almaniya.**

# Xinizî û bêbextiya Necmoyê Sêrtî

**Newroz**

Li gora belgeyên dîrokî, piştî girêdana civata Xoybûnê û destpêkirina şoreşa Agirî, Mîr Celadet Bedirxan, Şêx Ebdurehmanê Garisî bi biryara Xoybûnê agedar dike ku ji bo fişarê li ser Agirî sivik bike, divê ew here Botanê li dij dewleta Turkiyê eniyeke şer a nû veke..

Şêxê Garisî digel hin şervan û bekçiyê xwe Necmoyê Sêrtî derbasî aliyê din ê welêt dibe. Şervan jê vediqetin, ew û Necmo bi tenê didine ser rê û berê xwe didine gundekî. Necmo ji Şêx re dibêje: Şêxê min, tu mirovekî kal î, tivinga xwe bide min da ku barê te sivik bibe û em dereng nemînin. Baweriya Şêx jî bi Necmo heye! Radibe tivinga xwe didiyê û li pêşiya wî diçe. Necmoyê xiniz, xulamokê dewlta Turkiyê, bê bextê rûreş, ji pişt ve, berê tivingê dide bejna Şêx Ebdurehmanê Garisî, welatparêz û şoreşgêrê bi rûmet, wî dikuje û bi kêra berîka xwe, serê wî xweşmêrî jêdike û diyarî berpirsên dewletê dike!!.

Di hemû dem û qonaxan de û li cem hemû gelên cîhanê bûyerên xembar ên mîna vê xiniziya gemar hene, û her ew ê bimînin, ji ber ku mirovên erzan, bê bawerî û xwefiroş di nav hemû gelan de hene û her dê hebin. Divê em matmayî nemînin û xwe bi giranî lome nekin, her em bawer bin ku mirovên qenc, xebatkar û dilsoz, ji xiniz û patoxweran bêtir in, û ew in yên hêvî li ser wan têne girêdan. Xwefiroşên mîna Necmo îro jî hene, ji bo bidestxistina çend pereyan, li kêleka dagirkerên gel û welatê xwe cih digrin, û hin ji wan jî, li Efrîna dagirkirî,




«Şêx Ebdurehmanê Garisî- ji malpera Bûyer press»

di tariya şevan de, bi sernizmî û rûreşî, didine pêşiya hêzên tewan û tariyê, dibine mala welatparêz û xebatkaran, birayên xwe didine girtin, hin ji wan li ser destên neyarên gel têne kuştin!.Lê, şeva tarî çiqasî dirêj bike jî, her berbang û beyanî li pey e, ji rûreşiyê pêve, tiştek ji wan xinizan re namîne.

---

**Ji zeviyên ... Dûmahîk**

15 donim

Ednan Ebdulbaqî Sefo: 10 donim

**Gundê Nasiriyê:**

Kermo Ibrahîm eldawê: 50 donim

**Gundê Şerefiyê:**

Xald Nûrî Temo: 100 donim

Îsa Nûrî Temo: 65 donim

Ebdulbaqî Hemîd Biro: 30 donim

Mehmûd Mûsa Sîno: 30 donim

Ibrahîm Ehmed: 15 donim

Yûsif Izedîn:40 donim

Mûsa Hac Hesen: 13 donim

Ehmed Hesen Dawê: 20 donim

Yûsif Tahir û birayên xwe: 50 donim

**Gundê Sinceqê:**

Merwan Mihemed Reşîd: 180 donim

Ismayîl Reşîd:85 donim

Welîd Reşîd:210 donim

Hac Daro: 170 donim

Izedîn Bêjo: 100 donim

Xalid Hesen: 90 donim

Siûd Cime: 17 donim

Şîxmûs Hemê: 40 donim

Mihemed Lalo: 50 donim

**Gundê Şerefiyê 2:**

Xalid Ibrahîm:70 donim

Mihemed Îsa: Traktora wî û alavên wê hatin şewitandin.

**Gund Sefer:**

Dara Ibrahîm 90 donim

Yûsif Mihyedîn: 170 donim

Elî Hemo: 170 donim

**Gundê Meşqoq:**

Helûş: 200 donim

**Gundê Hemîdiyê:**

Şêx Mihemed Îsa: 900 donim

**Gundê Berkevirê:**

Silêman Xelef: 60 donim

**Gundê Şorê:**

Ji gundiyan 400 donim

**Gundê Bîrkinês:**

Heysem Salih Oskar: 500 donim

**Gundê Bişêriyê:**

Hemîd Hac Mihemed: 90 donim

Hisên Diham: 70 donim

Ehmed Mesûm Erebo:100 donim.

------------------------

*Derbasiyê 03.07.2019*

# Siwarê Kurd

**Husên M. Hebeş**



«Alexandru Macedonski»

*«Di sala 2014 ez li Festîvaleke helbestê li Romanya bûn (18th International Festival Curtea de Argeş Poetry Nights, Romania 2014). Li ineu rastî Zimannas, Wergervan, Rojhilatnas û mamosteyê zangoye Bucharestê Profesor George Grîgore hatim. Wî ez agahdar kirim ku helbesteke pir xweşik û ciwan bi ine SIWARÊ KURD heye û helbest ji berî niha bi 137 salan ji aliyê helbestvanê Romanî yê bi nav û deng Alexandru Macedonski hatiye nivîsandin! Bi rastî ew ji min re tiştekî pir balkêş û mezin bû. Min helbest bi zimanê Romanî daxist ser rûpela xwe ya Facebookê û hêvî ineu hevalên bi zimanê Romanî dizanin wê wergerînin Kurdî yan Erebî, rabû Dr. Tevfik Altonchi li xwe girt û ew wergerand zimanê Erebî –spasiya wî dikim- û min jî ji Erebî ew wergerand Kurdî.»*

## Siwarê Kurd

*Helbestvanê Romanî: Alexandru Macedonski*

Siwarê Kurd
weke tîrêjeke zindî
derbas dibe
Li ser pişta hespê xwe
Di nav deştan re
Di ser qûma bê deng re
Derbas dibe.

Tîna rokê lêdayî
Tîna ba jî
Ew mor bûye
Xweşik
Ciwan
Xort
Lewend
Ti kes weke wî tine.

Mesûl badayî
Rûgeş
Ciwanmêr
li ser lêvên wî yên têr
Simbêleke teze, zirav
şîndayî.

Du lingên dirêj
Bi hêz
Lez bi lez hespê xwe
dajo
Dil di sînga wî de lêdixe
Tijî hezkirin, lêdixe.

Di ser çolistanê re difire
Li ser qûma bêdeng re
Siwarê Kurd
weke tîrêjeke zindî
Derbas dibe.

--------------------

*Wergerandin: Husên M. Hebeş (Hussein Habasch)*

# Koma «ZOZAN» a Folklorê Kurdî

**Mihemed Dillî**

**Koma Zozan, li Şam a paytext, heta sala 1981an, bê nav dest bi karê xwe dikir û ew ji 4 endamên semayê(reqisê) pêk dihat, ew jî ev bûn: 1-Faroq Bekir(sergovend, tebmbûrvan û rêvebir). 2-Cemal Elî. 3-Hemîd. 4-Cemal Bekir û Ismayîl. Li sala 1981ê, Elî Cefer tevlî komê bû, beşê reqisê û rêveberî li dest xwe gerand û wî pêşiniyar kir ku navek li komê bibe û ew nav jî ZOZAN be. Li sala 1982an, beşê mûzîkê hate vekirin ku ji van endaman pêk dihat: 1-Mustefa Hesan(Durbekvan-Reqis). 2-Ismayîl Hesen(Mûzîkvan). 3-Mihemed Hesen(Stranbêj-Reqis). Selah Bekir(Tembûrvan-Reqis). 5-Ismayîl Cizîrê(Tembûrvan-Reqis). 6-Tac Cefer(Reqis-Kewres). Kewres ji van endaman pêk dihat: 1-Nîroz Hesen. 2-Emîne Cefer. 3-Emîne( Rosan) xelîl. 4-Fayize Xelîl. 5-Hemodê Bekir. 6-Şêrîn Bekir. 7-Hesonê Hesen. Li sala 1983an, Mihemed Dillî tevlî komê bû û rêveberiya komî lê hate sipartin, û wî dest bi dana korsên xwendina dibistanê yên sinifê 9an kir. Paşê, hunermend Hozan Bengî tevlî komê bû, û wî kom fêrî gelek tiştên folklorî kir, mîna Bazdan, Stranên Folklorî yên beşê din ên Kurdistanê, bi taybetî straên bi zaravê Soranî. Li sala 1983an, yekemîn roznameya ku navê meh û rojên salî bi Kurdî çap kir, li Şam û hemû deverên Kurdî li Sûriyê belav kir, û ji sala 1983an û pêve, kontrola ahengên cejina Newrozê kir. Têkliya xwe bi koma Zozan a Helebê re xurt kir bûn wek komekê . Li sala 1984an, Koma Zozan yekemîn kasêta**



**xwe ya stranan weşand û li herêmên Kurdî belav kir . di ahenga Newrozê de Şanoiyek pêşkêkir , ji aliye Rêber kasanî ( Husên) û Hemit avrazê , Faroq , Şêx birîmce , M.Dilli , Mone Bekir , Hozan Bengi ……. ve . Her çû endam û cemawer û hezkiriyên komê pirtir bûn. Koma Zozan têkiliyên hunerî bi komên hunerî yên Filestînê re kirin û bi alîkariya wan koman, Zozan di Şanogeha Unorwe yê de yekemîn kasêta xwe tomar kir.**

**Tiştên dîrokî: Di warê komên Folklorî de, cara yekemîn bû ku kasêt a komeke Folkilorî bi şêretên (bi deng) ên rêvebirê Kurd Osman Sebrî destpê dibe. Cara yekemên bû ku komeke Folklorî Kurdî li Sûriyê Stranan bi zaravê Soranî dibêje û belav dike. Diyariyek ji Rihmetî ê navdar Samî Ebilrehman wergirt. Lîsta navên endamêm komê bi deha ye û min pir nav ji bîr kirine. Ez lêborînê ji kesên ku navê wan hatiye ji bîrkirin dixwazim .**

**Wêneya li jor : Newroza şamê 1983 - Koma Zozan a şamê tev hin ji koma Zozan a Helebê, bi sergovendiya birêz Hesen Koşkar e.**

# Hin Têbîn Li Ser Şêweyê Nivîsê

## Şêrîn û xweşe zimanê Kurdî



**Mihemed Qere Hesen**

Weke em tev zanin ku şêwyê her nivîsekê xweyetiya nivîskar nîşan dide, û parek ji derûna wî ye. Ji ber vê têveliya nivîsê dewlemendîke ji wî zimanî re ye.

**1-Nivîsara darijtî:**

Darijtina vê nivîsarê bi vaceke « mentêq» ku mejiyê mirov erê û pesend dike û wateya her bêjekê bi vaca xwe ya xwezayî cihê di hevokê de digre, wate û agahiyan serast diyar dike, û hemî bêjeyên di ferhenga zimên de bi kartên tu merc û bend li ber nivîsarê tunene, ew jî li gor genca zimên û derûna kesê dinivîse û şêweyê nivîsînê tê darijtin û bêjeyan jê re hildibjêre û hişê şiyar»eqil-Elbatên» vî karî dike û vaca zanistî bi awayekî xwezayî bi kar tê, ev jî dikeve bin sîwana vî şêweyî ( gotarên rêzanî, civakî, abûrî û zanistî …). Ji ber vê xwênerên vî şêweyî bi qolayî û serast bê westan têdighe wateya wê û serê xwe pê re nêşe û pê narame , bi gelemperî hemî cemawer dixwîn e.

**2-Nivîsara wêjeyî:**

Ev şêweyê nivîsandinê vajayî zagon, vaca mirov û xwezayê ye, wateya wê şana wateke din dide. Ango bêje wêneyên tê ristine, nivîsandin bi xwe şan û kodine, bi hêsanî û serast watê nade, ew wate hiş û vaca wî napejirîne. Jêdera vê ramanê ji ya olî û evsaneyî hatiye , di vê vacê de rola hişê şiyar û neşiyar hebû ku xwe pê bawer bike, hest û henasên xwe vehesîne û çareyan ji gelşên jiyana xwe re bibîne. Wek jiyana di paşî mirinê re, bexşen û piyariya»rhima» Xwedê êşkencekirina ne rind, zordar û mafxweran di dojehê de… Ev nêrîn û vac bi xwe nêrîn û vaca wêjeyî ne, ku karê mirov nikare bike û netê kirin û bûyîn dike û tiştan ji ber xwe dafirîne û di xwe de çê dike, û kar û berpirsiyariyê pê hildipesêre. Wek afirandina hêzên rindiyê û nerindiyê, bihuşt û dojeh… nimûne:» Gava em dibêjin av ji jor ve berjêr diherike». Ev hevok darijtî ye , hiş û zagona xwezayê dipejirîne, zû û zelal mirov têdighe. Ger astên xwe yên zanistî çi bin jî. Lê eger em bibêjin:» Çemê avê berjor hildikşe û li ezmên deryakê çêdike!» Ev hevok vajayî vaca têgeh û zagonên xwezayê ye û hişê mirov napejirîne. Ango hevok wêjeyî ye, gava nivîsandina wêjeyî darijtî be û serast jê were agah kirin, jê re dibe leke û jariyê dide wê mijarê, ev şêweya nivîsandinê xwenerên xwe başqe hene û hindikin in, wêje bi hişê mirov re napeyve , lê deng li sawirê dike û çêja xwe pê dide zanîn.

Berhemên dikevin bin siya nivîsara wêjeyî ev in: Berhemên olî, evsanî, helbest, çêrok, roman… Piştî me raman û xêzên qaling ên herdu şêweyên nivîsandinê bi kurtî dan zanîn û qonaxa zimanê kurdî tê de dijî û rojên li pêş wî diyar in. Ango zimanê kurdî pê şaristana nûjen nehatiye çêkirin û di pir waran de cihê xwe negirtiye û bêjeyên xwe di kelepûrê de xewekirine, ji nuh ve were vejandin da ku careke din can pê werin , ev jî di rêya bikaranîna wan di hemî berhem û karan de werin kirin. Gava mirov berhemekê dinivîse tê de şêweyê darijtî û wêjeyî tev hev dike , wê hîngê jariyê dide wê berhemê, ne ku bêjeyên tê de bi karanîne, ne yên ku naskirî û nenaskirî, ji hêla din ve gava mijarek ji bêjeyên têvel û bi kar tên hêz û dewlemendiyê dide wê berhemê. Lê gava di çarçewa bêjeyên naskirî de be , dibe kilasîk ji şêweyê nivîsandina heye û cudahî û guhartin di nivîsandinê de çênebûye. Lê gava hin bi navê serastkirinê li gorî ferhenga têgeha, dilxwazî, gundîkî û zarava herêma xwe berheman binirxînim û bipîvim ! Tevî ku ziman ji hemî zaravan peyda bûye, zaravek ji ya din ne çêtire, bêjek ji ya din ne bi nirxtire. Gava zimanek di hemî war û aliyan de bi kar netê û bi hemî şêweyan jî netê nivîsandin, û xwe herdem neguhêre û nûjen neke, manda wî dêris û mirine. Divê deriyê nivîsandinê li ser piştê vekirîbe daku hemî şêweyên nehatine nivîsandin tê re derbasbin. Bi zimanekî din, yek ji mercên pêşketinê ye, gava hevokek cara yekê bi şêwekî nû tê ristin, wate, raman û wênekî ecer dide ew bi xwe pêşketine bêyî ku ew hajê hebin destê xwe tê pêşa vejîn û pêşketinê. Bi nêrîna min zelalî û ne zelaliya nivîsaran ne bikaranîna bêje û gotinan ve ye lê bi şêweyê nivîsandinê ve girêdayî ye, ev ji hêlekê ve û ji hêla din ve jî, giring e xwêner here ba asta nivîskar û jê ve nêzîk bibe, ne nivîskar dagere asta xwêner. Ji ber ku çavên mirov……….

11

# Tayek porê sipî (Li ser şopa Menfelotî)

**Qedrî Can***



Îro, sibehê di ber yanê re derbas dibûm. Min, di nav porê serê xwe de tayekî sipî dît... Mîna birûska nav şeva tarî, diçirisî…Çavê min pê ket, veciniqîm, mîna ko ji nişka ve, şûrek li serê min keve…Nola ko yek ji ezmên dakeve, û di destê wî de aleke sipî hebe û mizgîna mirinê bide min… Min fam kir ko, derdekî bê derman e, yan jî tayek ji tayê kefen e…

Ey tayê sipî! Min tu rengê sipî mîna gewrbûna te reş…Û tu nûr, qandî nûra te tarî ne dît…Te, her tiştê spî li ber cavê min reş kir, heta ronahiya hêv û tavê…Heta roniya ger du çavan…Û te, her tiştê reş jî li ber cave min sipî kir, heta qijika reş…heta bext û dilê reş…

Ey tayê sipî! Te, xwe di kîjan pencerê re avête ser serê min û te, di kîjan rê re xwe gihande cênîka min?!.Tu çawan di zeviya reş û tarî de, tek û tenha, bê heval û hogir karî bimînî? Qet cavê te ji vê tariya reş natirse.

Ey tayê sipî! Ez nizanim xwe çawan ji te xelas bikim û çawa ji te birevim!!. Tu fêdeya wê ji min re nîne ko ez te ji cihê te bikişînim yan jî te boyax bikim.. Ez naxwazim ko di nav du misîbetan de bimînim, misîbeta derewan û misîbeta pîrbûnê.

Ey tayê sipî! Ez dibînim ko tu xwedî dek û rip î, tu, hêdîka, di guhê cîranê xwe de dikî»kur û pis» û tu, wan dixapînî, ko ew jî mîna te bibin, û cilên ko te li xwe kiriye ew jî li xwe bikin… Tu dixwazî di nav vî diyarê bê deng û bê gir-gêc de, ceng û ciladekê çêbikî…da ko her kes di bin lingan de biperçiqe…Tu, mîna insanê sipî dikevî nav welatê reşikan û wan dixapînî û tu wan rebenan ji xwe re dikî kole û bende.




«Mostefa Lutfî Elmenfelotî nivîskar û wêjekarê Misriye (1876- 1924) an, xwediyê gotara (Mûyê Sipî-الشعرة البيضاء)»

Ey tayê sipî! Tu kî yî, tu çi yî, kê tu şandiye û karê te li ba min çiye?! Heke tu mêvanî, kanî izin û destûra ko min daye te? Heke tu bi hevaltî hatiyî cem min, ez wî hevalê ko min bi xwe re bibe gornê naxwazim… Xwedê zane ko tu mîna wan maran î ko hêlînê her tebayî kuna xwe dizanin.

Ey tayê sipî! Min pir ji te gilî û gazin kirin, lê ez dibînim ko ez ne rast im, dîsa tu ji her tiştî, ji her kesî bêtir li ba min bi rûmet, li ber çavê min bi qedr dimînî…Serê min ji te re zozan û pîroz be…Tu ji xwe re-mîna dixwazî- tê de vegevize.

Ez dizanim tu, rêberê mirinê yî, rêberê wê rêyê yî ko tu rê lê nabe…Çima ruyê xwe ji te tirş bikim? Min ji xortaniya xwe tu xêr ne dît ko ji pîrbûna xwe bitirsim…Min şêraniya dinê tam nekir ko talbûna axretê madê min tirş bike… Wey li ser seran û li ser çavan hatî, ey tayê sipî!..

** Ji kovara RONAHÎ, hejmar 13, 1ê Nîsana 1943an*




---

**Hin Têbîn ... Dûmahîk**

herdem li pêşe. Li van çend salên dawî hin biwêjan an hevokan li şûn bêjekê bikartînin, tevî ku zimanê kurdí zimanekî kîteyî ye. Ango her bêjeka watekê dide û ramanekê şanî dide. Ne wek hin zamanane ku her hevokek ramanekê nîşan dide weke zimanê çînî. Wek hevoka « jiyana xwe ji dest da «wate û ramana xwe jî mirin e. Çima bêjeya mirin a ku ji pênc tîpan bi kar netê li şûnê hevokeke ji deh u hrft tîpan bi kar were. Hevok awazê girantirî gotina mirin e. Û hefdeh caran tiliya xwe li tîpan dide. Û nivîsandin bi şêweyî pir in. Dest nîşan kir. Çû ser qedera xwe. Hevcêwî ….Ev ton şewe nivîsandinê pir lawaz dike, û nivîsê paşde dide. Berê pêşketinê ber ve kurt û sivikirinê ye. Hin jî hene bê li bêjeyên berê li ser zar û zimanê gel diger bi kar nîn hema bilez dibezin gotina bi hev dixin û bêjey in nû çêdikin û dibêjin em zimên bi pêş dixin, tevî ku bi xwe jî di zimanzanînê de ne pisporin. Nimûn e: jînistan. Li vir mirov dipirse ma kîjan paşkîta raste bi bêjeya jîn keve( stan, geh, xan…) ? û ev hemî navê jîn dikin navê lûsê. Şêweya nivîsa pir kar anîna bêjeyên li hev siwar kirî, şewekî xwêner di têgehê de dilukimîne serast û zelal tênagehe wateyê. Û awazê bilêvkirinê li ser guh giran dibe. Ev şêwe kevneşop dimîne û ji rêya bilindkirina nivîsê bi der dikeve.

# Êdî ew nasname ye!

## Çiya, gelî, zanîngeh, kargeh, dar,... kevir û dîwarên Kurdistanê bi navê Qasimlo hatine xemilandin

**Kerîm Perwîzî***



Dr. Qasimlo rêberê tevgereke neteweyî û demokratîk bû ku dehan salan li dijî her du desthilatên paşatî û Wîlayeta Feqîh xebat kir. Wê tevgerê ji serhildanê heya rabûna ser piyan, ajarvedan û pişt re jî heya mezinbûn û berfirehbûnê, herwisa dema veqetiyan û şikestan û di dema paşvekişîn û pêşketinan de gelek ezmûn bi dest xwe ve anîn ku pareke zêde ji wan destkeftan di dema Pêşewayê nemir de hatibûn bi destxistin. Lê berdewamkirina vê rêbazê, vejandin, berhevkirina dubare a rêbazê, rêkxistina dubare, modernîzekirin, demokratîzekirin û geşepêdana dubare a vê rêbazê di stûyê Dr. Qasimlo de bû. Ew bi raman, hizr, xebat û xwîna xwe heya hertim bû darê berûyê ê mayînde û li ser piyan ku ti bahozek nikare bandorê bike ser rihên wî darî.

Dr. Qasimlo bi awayekî av daye darê berûyê ê şoreşa nîştimana me Kurdistanê û dar heres kir û pişt re wî darî ajar veda, ku Kurd di bin siya wî darî de bêhna xwe vedidin. Herwisa ew dar bûye hêma û handerê neteweyên din li Îranê. Bi taybetî azadîxwazên rastîn li wî welatî, wî hertim weke çavkaniya perwerde û handanê dibînin.

Desthilata Komara Îslamî di Pûşpera xembar a sala 1368›an de dixwast bi teqekirin li mejiyê tevgera netewî û demokratîk a Kurdistanê, vê tevgerê tûşî feleca hizr û mejî bike. Rejîmê dixwast bi vî awayî laşê bê ser ê vê tevgerê bike sotemeniya xwestekên xwe ên gemar û kirêgirtiyên xwe ên destkird. Lê nedizanî ku Dr. Qasimlo, darê berûyê ê şoreşa Kurdistanê ye û êdî bi rihên dîroka Kurdistanê ve hatiye girêdan. Tenê hin kadir û pêşmerge li derdora Qasimlo nîn in, lê belê tev dar û kevirên Kurdistanê wê bibin neynûka rengvedan û tîrêja ronahiya hizr û manîfestoya Qasimlo.

Şoreşa nîştimanperwerî û karwanê avakerên bingeha nîştimana nû, gav bi gav û qonax li pey qonax, bi Rasan›ê serî li waneyên Qasimlo didin. Qasimlo ji wan dûr nîn e û di odeya kar û xebata wan de, di çepera parastinê de, bi mûzîka telefûnên wan, di naveroka pirtûkên zanîngeha wan de û bi medalya ser sîngên wan re ye.

Çiya, gelî, zozan, kolan, bazar, zanîngeh, kargeh, karwan, dar, kevir û dîwarên Kurdistanê bi navê Qasimlo û bi bîranîna wî hatine xemilandin û xweştirîn mûzîk piştî Ey Reqîbê li cem Kurdên welatê rojê û rojhilat, sirûda Xwedeyo Welat Ava Ke ye.

Piştî derbasbûna 30 salan di ser xedr û tawana li hemberî Kurdistanê û Kurdan re, hêviyên dujmin hê bicî nebûne û Qasimlo êdî tenê sekreterê partiyekê nîn e. Lê belê ew bûye nasnameya şoreşa neteweyekê û hêma û armanca pêşerojê ji bo avakerên nîştimanê.

** Sergotara rojnama Agirî- hejmar /354/- 22 Tîrmeh 2019*

# Mamoste Reşîd Mustefa bar kir



Roja 07.07.2019an, li bajarê Qamişlo Mamoste Reşîd Mustefa koça dawî kir û beşdariya birek ji rewşenbîr, hezkerên wêja û zimanê Kurd li goristana Mehmeqiyê hate veşartin.

Mamoste Reşîd (Bavê Şêro) yek ji perwerdekar û mamosteyên Bîrkariyê(رياضيات) bi nav û deng bû, bi sedan xwendekarên dibistanê li bajarê Qamişlo li ber destê wî xwendine û derçûne.

Herweha mamoste Reşîd yek ji hezkerên doza gelê xwe û evîndarê zimanê dayikê bûye, gelek gotar pê nivîsandine û bi dilgermî nav di keç û lawên Kurdan dida ku ew li zimanê xwe xwedî derkevin, fêrî xwendin û nivîsandina wî bibin.

Bila serê malbat, dost û merivên wî sax be û cihê wî bihuşt be.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**